Newroz Hejmar ( 78 ) Rûpel (7) Subat 2008z – 2619k

# SÎNEMXAN
# Û RESMÊN RONAHIYÊ(*)

SİNEMXAN
Û RESMÊN RONAHIYÊ

Hejmara Ronahiyê a didowan biderketi bû. Min jê çend niviştanî bûn mal. Çavê Sînemxanê pê ket û ji min pirsî:

— Bavo ev Hawar e an Ronahî ye?

Min got: keça min ev Ronahî ye, Hawara nû heta çend rojan wê derkeve.

— Ji kerema xwe ka yekê bide min.

Min niviştek da-ê.Sînemxanê

Hejmara Ronahiyê a didowan biderketi bû. Min jê çend niviştanî bûn mal. Çavê **Sînemxanê** pê ket û ji min pirsî:

- Bavo ev Hawar e an Ronahî ye?.

Min got: Keça min ev Ronahî ye, Hawara nû heta çend rojan wê derkeve.

- Ji kerema xwe ka yekê bide min.

Min niviştek da-ê. **Sînemxanê** Ronahiya xwe kire ber xwe û bi diqet li resimên wê temaşa kir. Piştî ko temaşa xwe qedand serê xwe hilda û gote min:

- Bavo! Ev Ronahî ne qenc e, a din jê çêtir bû.

Min got: Keça min, ji bervajî ve, ev Ronahî ji a din qenctir e, resimên wê bêtir in û bi tevayî ji a niviştа pêşin lihevhatîtir e. **Sînemxanê** li min vegerand û got: No bavo, ev Ronahî ne spehî ye. Resimên tê de hemî resimên apê ingilîz û eskerên apê Lêzgo ne-yanî firensiz- tu resimên kurdmancan tê de nînin . Di a din de resimên kurdmancan hebûn; kurdmanc direqisîn.

**Sînemxanê** hinek sekinî. Qey dida eqilê xwe û xuya dikir ko qîma xwe bi vê Ronahiyê ne dianî û hêj dilê xwe li min rahet ne kiri bû. Careke din serê xwe hilda û gote min:

- Bavo, ji boyî Hawarê gava em ji te dipirsin tu dibêjî: Ev Hawara kurdmancan e, ma Ronahî jî ne Ronahiya kurdmancan e?.

Ez kenîm û min lê vegerand û got: Belê **Sînemxan** xebera te ye. Lê tu dizanî ko dinya şer e û her tişt giran bûye, em nikarin ji nû ve klîşan bidin çêkirin. Bi klîşeyên hazir û berdest em bes dikin. Kanî resimên kurdmancan, ji xwe resimên kurdmancan li nik me nînin.

**Sînemxanê** nemerdî ne kirhema rabû çû û resimekî xwe digel **Cemşîd** anî û da destê min û got: Ev e ji te re resimekî kurdmancan, ma ez û **Cemşîd** em ne kurdmanc in?. **Cemşîdê** ko heta hingê têkilî ştexaliyê ne dibû gava navê xwe bihîst bêî ko bizane em qala çi dikin berê xwe da min û got:

- Belê bavo ez jî kurdmanc im; ez torinê mala Azîzan im.

Zarowan zora min biri bû. Min nizanî bû ez ji wan re çi bibêjim. Heq di destê wan de bû lê min ne dikarî bû ez daxwaza wan bînim cih. Min resimê wan kire kûrika xwe û berê xwe da çapxanê.

---

**(*)-Kovara RONAHÎ- Hejmar 3- Duşemb 1Hizêran1942- Rûpel 3- Bi pênûsa Mîr Celadet Bedirxan hatiye nivîsandin**